


## Çawa Cîhan Bê guherîn?

“Dolores Huerta” Dibêje: “Her êliyek şansek e bo xwe guherandinê, her mirovek hêzek e bo guherandin, her deqîqeyek derfetek e bo guherandinê.”Guherandina cîhan xewna mezin a me ye. Mebest li guherandina cîhanê, ew coğrafyaya piçûk .......

Dom»R:10




*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (496)21-06-2025Buha (1000) Tûmen



## Bersiv li ser paşguhxistina Doza Kurdî li Sûriyê

Ji demê hatina Ehmed El-Şerih li ser desthilatê li Sûriyê, piştî hilweşîna rejîma Esed di 8ê çileya sala borî de û heta îro, rewş û rastiya Sûriyê ya civakî, cugrafî, siyasî, etnîkî û olî tê paşguh xistin, û bi taybetî ku hebûna gelê Kurd bi carekî tê paşguh xistin, her bigire ji lidarxistina Kongirê diyaloga nîştimanî û piştre damezrandina komîteya destûrî, heta bigehê avakirina hikûmetê û damezrandina saziyên desthilatdariyê û artêş û asayîşê heta vê dawiyê bi destnîşankirina ......

Dom» R:9



## Şerê di navbera rêjîma Îranê û Îsraîlê de û armancên me Kurdan

Di meh û salên dawî de, alozî û têkçûn di navbera rejîma bi nav Îslamî ya Îranê û Îsraîlê de gihîştiye asteke bê mînak. Ev şer, ku gelek caran şerê bedel û hin caran jî rasteras bûye, ne tenê qada Rojhilata Navînê, belku jiyan û pêşeroja milyonan mirovan tê de hatiye wêran kirin. Di vê rewşê de, gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê û parçên din, her gav di bin zordestî, û nedadatiya dîrokî de maye.

Dom» R:6

# Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê: Eva ku li Îranê de diqewime, berhema siyasetên komara îslamî ye




Sibêdeha roja Înê 23ê Cozerdana 1404 a Rojî, Îsraîlê li çend pêlên êrîşkirinan ên berfireh de çendîn binkeyên serbazî û navkî yên komara îslamiya îranê li çend bajaran de bombebaran kirin, Herwisa çend zanayên navkî û hejmarek ji fermandeyên payebilind ên spaha pasdaran û hêzên çekdar ên komara îslamî kuştin.

komara îslamiya îranê bi sedema naveroka şerxwazane û qeyrançêkera xwe û bi dîtingeha siyaseta şerxwazî û necihgîrkirina ewlehiya deverî û cîhanî, vê carê pêşqelê agirê şer anî navxweyê Îranê, ew rêjîma terorîst ku amade nîne ti biryarname û rêkevtineke navnetwî qebûl bike, rêz li serweriya siyasî ya welatên din bigre û xelkê Îranê wek mertalek bo pêşvebirina siyaseta xwe ya çewt û dijîgeliyane bi barimte girtiye, berpirsayarê tevahiya qeyranên niha û yên vê rewşê, ku bi ser welat de hatî sepandî ye.

komara îslamî li demekê de dihola şer dikute ku ev şera, şerê gelên Îranê û berjewendiyên wan nîne, Belku şerê desthilatbidestên komara îslamî ye ku heta niha hemû dahat û serweta xelkê û welatê Îranê bo armancên xwe yên îdeolojîk, bi heder daye û qeyran li pey qeyran, bo xelkê û civaka Îranê li pey xwe tînin.

Xelkê Îranê li heyama zêdetir ji 4 dehikan a temenê komara îslamî de bi berdewamî bi rêyên cur bi cur ên wek baykotkirina binav hilbijartinan, mangirtinan, nîşandana nerizayetiyan û xwenîşandanên giştî bi taybet li tevgera “Jîna”yê de dengê xwe gihandiye civaka cîhanî û bi eşkere ragihandiye ku vê rêjîmê, ti rewatiyek siyasî û gelî nîne û bi şêwazên cur bi cur, îradeya xwe bo derbasbûn ji komara îslamî dane xuya.

47 sal desthilata reş û tepeserker a komara îslamî, encama vê bi tenê teror û kuştina xortên azadîxwazên welat, tepeserkirina hemû maf û azadiya xelkê, kawilkirin û parehêlana welat li warên aborî û jîngehî û pengurina sedan qeyranên siyasî, mirovî û civakî ye ku komî ser hev bûne.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Desteya Kargêrî**

**23ê Cozerdana 1404 a Rojî**



## Operasyona bi navê Şêrên Rabûyî a Îsraîl bo ser rêjîma Îslamiya Îranê

Dom » R:3



## Sîyaseta netewî çi ye, naverok û paradîgmaya wê çawa ye?

Dom » R:4

# Derfetek zêrîm



**N. Nûredîn Sofîzade**



Bi salan rêjîma dîktatora Îslamî cehd dikir ku bêxe zêhna xelkê Îranê de ku bêje wan Îsraîl û Amerîka dujminê wan e. Lê îro em bi çavê xwe dibînin ku êrîşên Îsraîl ne tenê xelkê sivî li Îranê de nake armanc û cehdê dike ku xisar ber xelkê nekeve, belku yêk bi du yêkê de wan deshilatdar û piledarên ku bi salan e destê wan bi xwîna xelkê welat sor bûye û di qesr û koşkên xeyalî de kevtibûne dizî û fesadê.

Ev kesane bûne armanc ku ji serweta xelkê Îranê, ji keda kirêkaran, mamostayan, karmendan, û qatên cudaye civakê didizîn û dixwarin, kesanekan dike armanc ku sebebkarê hemî rojreşî, kuştar, sêdaredana lavan, tepeserkar, terorîst, û dijî hemî xweşî û azadiyekî xelkê ne.

Rêjîma dîktator ku bi salan bi pirojên îtlaatî û emelyatî li Sûriye, Îraq, Lubnan, Felistîn, Yemen û gelek cihên din, dixwast her derî aloz û ne ewle bike daku agirê sernixûniya xwe ji xwe dûr bike, niha kevtiye nava rewşekê ku divê hebxwe bersiv peyda kiribe ku gelo çima evên li koşk û serayande rûniştinî bûne armanca êrîşa Îsraîl, ne xelkê bindeste Îranê.

Ku wisaye ev gotina raste ku, Ne Îsraîl dujminê xelkê Îranê ye, û ne jî rêjîma Îranê nûner û qeyûmê wan e.

Niha pitir ji her demê girîng e ku dengê rastîn û azadîxwaziya xelkê Îranê bigehe guhê cîhanê, heta ku media, raya giştî, dewlet û rêkxistin bi rondikên direvîn û xwe mezlûmkirina komara neyêne xapandin.

Xelkek ku bi salan ji aliyê wê rêjîmê ve hatiye tepeserkirin, hatiye kuştin, talankirin, îro qurbanî nîne belku derfetek zêrîn bo hatiye pêş ku ji destê êxsîriya vê rêjîmê xwe xelas bikin.

Niha sitûnên kela zilma rêjîma Îranê kevtine lerzînê û ev qonaxa me gelê Kurd û rêkxistinên siyasî jî erkdar dike ku hewceye bilez tev bigerin bo çêkirina yêkitî û yêkhelwêstiyê ku çavê gelê me li we ye daku bikarin li vê derfetê de gel rêkxistin bikin daku vê carê jî bi sedema nakokiyên îdolojî û rêkxiraweyî derfet ji dest neçe ku piştre poşmanî çi çareserî nîne.

Lewra derfetek zêrîn bo netewên bê mafe wek Kurd, Belûç û Ereb re hatiye pêş ku wan ji hemî demê bêtr erkdar dike ku ji wê derfetê mifahê wergirin, xwe rêkxistin bikin, bi yêkdengî û yêk gotarî dengê xwe bilind bikin û çarenivîsiya xwe bidest bigrin ku sedan sale ji aliyê qewmeke navendgera û bi navê yêk milet û yêk xak û yêk ala û yêk çanê, cehda asîmîlasyona netewên jêrdest daye.

Gelê me amadeyê her rewşekêye û hertim amade bûye li pêxema armancên netewî û azadiyê de, hemî nirxekê bide, lê tenê çavê wan li yêkdengiya partên siyasiye ku pêşengiya wan bikin.

Hewceye ku partî û rêkxistinên netewî yên Rojhilatê Kurdistanê ku di nava gelê me de xwedî pêgeh û mitmaneya siyasî ne û gel wan bi pêşengê xebat û doza rizgarîxwaziyê dizane, bi hemî cudahiyên fikrî û rêkxistinî û îdolojîk, cudatiyên xwe danêne qirax û bi yêkgotarî û amadekarî bo pêşhatan, gel dilgerim bikin bo xebat û berxwedanê.

Tenê yêkitî û hevkarî û hevxebatiya partiyên siyasiye me ye ku dikare serkeftinê misoger bike û pêşerojekî geş ava bike.

Berî hemî aliyekê çavnihêriya gel ji Hizba Dêmokrat a Kurdiastana Îranê heye ku gorî qeware û hêz û hitbar û derbasbûyî ku bandora rastevxwe li ser bihêzbûna hişmendiya netewî li Rojhilatê Kurdistanê heye, divê pêşqedemê çêkirina vê yêkitî û hevxebatiya partî û aliyên siyasî be û hemî aliyekî azadîxwez û welatparêz ku bawerî bi mafê netewî hene û rêzê ji dêmokrasiyê digrin, li devra maseya biryar û helwêsta bo qonaxa niha kom bike.



# Operasyona bi navê Şêrên Rabûyî a Îsraîl bo ser rêjîma Îslamiya Îranê



N. Serbet Urmiye

**Pêşgotin: Agir li Esman, Erdhej di Siyasetê de**

Di 13ê meha pûşper a 1401'an a Rojî de, artêşa Îsraîlê Operasyona "Rising Lion" wate Rabûna Şêr da destpêkir ku Rojhilata Navîn ber bi qonaxek nû ya pevçûna leşkerî û hember a du hêzên îdeolojîk û jeopolîtîk ve bir. Armanca êrîşan bi tenê navendên navikî yên Îranê nebûn, hevdem pêkhateya fermandehiya Sipaha Pasdaran ku baskê bi hêz yê rejîmê jî bû, ji ber hev hilweşand. Di hember de bersiva rejîma Îranê wate êrîşa"Soza Sadiq 3" ku heyamek bû rejîmê gefa vê li Îsrayîlê dikir, da xuyakirin ku rejîma Tehranê ber bi asoyeke ne zelal ve diçe.

**Îsraîl: Derbeya yekem,Teknolojî û zanist**

Di êrîşa han de, zêdetirî 200 balafirên pêşketî û hemdemî yên şer weke F-35, F-15 û F-16 û ... karîn bi hêsanî û bêpirsgirêk ji şîstema berevaniyê ya rejîma Îranê derbas bibin û Tehran, Natanz, Îsfahan û piraniya cihên sitratejîk û leşkirî yên Îranê bikin borkanek ji agir û dûkelê. Bombeyên pêşkevtî û xwedî teknolojiya kontirol kirinê û êrîşên sayberî ên hevdem, karîn sîstema berevaniyê ya rejîma Îranê bêbandor bikin.Ji bilî vê çendê kuştina komek ji fermandarên paye bilind yên weke Huseyîn Selamî, Mihemed Bagherî, ... û zanayê etomî weke Fereydûn Ebasî û .... htd kêrhatîbûna Îsrayîl û Mûsad"ê li hember rejîma Îranê de bi eşkere da kifiş kirin. "Rabûna şêran" di warên hişmendi, hemahengî, pêşdeçûn û hêza leşkirî û êrîşê de weke pêngeheke micid û xaleke bingehîn di doktrîna berhingariyê ya Îsrayîlê de hate dîtin.

**Îran: Bersiva Moşekan, pêkhateya Lawaz**

Di bersivê de û li gor gotina berpisiyarên leşkirî yên mayî, rejîma Îranê zêdetirî 350 mûşek û diron avêtine Hayfa, Tel Aviv û Aşdodê. Dronên Şahid 136 li hin deveran gihîştin armancê, lê bersiva bilez a pergala parastinê ya Îsraîlê (Qubbeya Hesinî û Bereqaniya Dawûd ) bersiva han sînordar kirin û nehêştin weke hewce û li gor piropagendeyên rejîma Îranê peeve here . lawazî di sîstemên hişmendia haydarkirinê de , kêrhatî nebûna sîstema pedafend a hewayî û koştina komeke berçav ji fermandarên payebilind yên leşkirî, Îranê di rewşek dijwar de ragirtiye.

**Şerê piralî: Ji esmanan û di Îdeolojiyê de**

**1. hevrikiya Îdeolojîk: Şoreşa Îslamî li hember Zayonîzmê**

Di navenda meydana hizrî ya şerê Îran û Îsrayîlê de hevrikiyeke micid a îdeolojîk heye ku rêberiya gotara dijberiyê di navbera herdû aliyan de dike. Ji sala 1979'an vir ve, Komara Îslamî ya Îranê hebûna Îsrayîlê nepejirandye û hertim gefa ji holerakirina wê dike. Rejîma Tehranê bi avakirin û piştewaniya taqimên terorist û tundajo yên wekî Hamas û Hizbullah û ...htd , şerê li dijî Îsraîlê ne tenê weke erkekî siyasî şirove nake, belkû weke esleke olî û şoreşgerî dibîne û xwe wekî parêzvanê çîn û qatên bindest di cîhana Îslamî de dide xuyakirin. Berevajî vê, Îsrayîlê ku di dîroka xwe de ezmûna reş a Holokostê heye, ji gefên Îranê wekî hebûna xwe mêze dike. Daxuyaniyên cuda û carna jî dijber ên rayedarên Îranê li dor ji holêrakirina Îsrayîlê, hegera meşrûiyeta bizav û kiriyarên xwe parastinê ne bo Tel Aviv'ê. Hevrikiy han di îdeolojî ê gotara şer û xwe parastinê di navbera herdu aliyan de ji bilî şerê rasterast mêj ve ye ku bûye sedema şer di warên medyayî, çandî û siyasî.

**2. Hevrikiya stratejîk û Ewlehiyê: Pêşîlêgirtin an Berxwedan?**

Di hêla stratejî û ewlehiyê de, her du alî wate Îsrayîl û Îran du nêzîkatiyên di du helên bi tevahî dijberî hev de dimeşin. Îsrayîl cextê li ser esla pêştewaniya bihêz û çalak dike û bi mifah wergirtin û nûjenkirina berdewam a sîstema zaniyarî, hemaheng kirina operasyonên sayberî û leşkerî, hewl dide ku gefên rejîma Îranê berî ku rast derkevin, çine bike.Di hember de, rejîma Îranê li ser pêşîgiriyê di rêya berxwedanê de tekezê dike û xwe dispêre hêzên herêmî yên wekî Hizbullah, Hemas û Hêzên Heşd el Şeibî. Rejîm di hizra xwe de hewl dide ku bi wî terzî bihaya êrîşan li se dijmin zêde bike. Bi gotineke din, Îsrayîl gefan berî ku bibin kiriyar ji holê radike, di heman demê de Îran hewil dide ku gefên ku jê têne kirin bi herêma derdorê xwe ve parvebike.

**3. Piştgiriya Navneteweyî: Aşkere û Sînordar**

Li ser asta navneteweyî, piştewanî faktoreke girîng e ku hevsengiyê di navbera hêza herdu aliyan de dide xuyakirin:



Di hêla navneteweyî de, Îsrayîl piştgiriya fermî û berfireh ji aliyên rojavayî weke Dewletên Yekbûyî, Berîtanya, Firansa û NATOyê werdigire, ku pêgeheke bi hêz di milê leşkerî û dîplomatîk de dide Îsrayîlê.Di hember de, Îran di asteke nizimtir de û tenê li Rûsya û Çînê nêzîk e ( vê dawiyê û piştî destpêkirina gera nû ya şer de, dewleta Pakistanê jî bi terzeke piştgiriyê didê), ku ev jî di demên çarenivîssaz û qeyranan de hertim bê helwest derketine. lewra rejîma Îranê pitir bala xwe dide taqimên şerxwaz ên herêmî yên girêdayî xwe û bihêz dike. Hevseng nebûna han di aliyê hêz û piştewaniya cîhanî de dikare heta qasekê encama hevrikiya han eşkere bike.

**Çar senaryoyên sitratejîk ên Bersivadanê li ser rêrya Îranê**

Rejîma Îranê di rewşa ku niha bi ser de hatiye, ber bi rûye çar vebijêran hatiye ku bersiva êrîşên Îsrayîlê bide. Êrîşa rasterast bi mûşekan, êrîşa sayberî, bersiv di rêya teqimên girêdayî bi xwe ve û bêhnfirehbûn(sebir)a sitratejîk. Ezmûnên berê û kiriyara hember ya vê carê jî li hember êrîşa Îsrayîlê, daye eşkere kirin ku rejîm di êrîşên mûşekî û sayberî li hember Îsrayîlê de lawaz e û şikest xwariye. Bersiv di rêya taqimên girêdayî bi rejîmê ve jî renge bihaya şer bo rejîma Îranê hindekê siviktir bike, lê dê welatên wan jî bike meydana şer û Îranê ber bi rûyê helwestên navneteweyî bike. Di vir de bêhnfirehbûn(sebir)a sitratejîk ji rejîmê re dimîne ku ev jî li gorî ezmîmna vexwarina cama zehrê di dema şerê Îran û Îraqê de, texmîn tê dayîn ku bikare heta qasekê di gaziya rejîmê de were. Lê bihayeke giran bo ser man û berdewambûna rejîmê heye. Ji ber ku vekişiyana bê bersiv dê pêgeha siyasî û leşkerî ya Komara Îslamî hem di nav alîgirên wê de lawaz bike hem jî dê hebûna rejîmê di astê navxweyî yê Îranê de ber bi rûyê arîşeyan bike û rêya hilweşiyana rejîmê veke. Bi xasmanî ku rejîmê demeke meşrûiyeta xwe ya rastin dinava gel de ji dest dayê.

**Berteka Navneteweyî: xweragirî yan Amadekarî?**

Berteka navneteweyî ya li hember êrîşa Îsrayîlê ya li ser Îranê, bertekeke li ser xwe û dualî bû; Amerîkayê, bi piştgiriya siyasî ya Tel Avîvê, xwe ji beşdariya rasterasd di şer de dûr ragirtiye, di heman demê de Rûsya û Çîn banga sekinandina şer dane. Yekîtiya Ewropayê û Neteweyên Yekbûyî jî li ser agirbes û hewlên dîplomatîk tekezê dikin. Di vê navberê de, bêdengiya welatên Kendava Erebî jî bi terzekê razîbûna wan ji lawazbûna pêgeha rejîma Îranê di herêmê de xuya dike, bê vê çendê ku bi eşkere bibin aliyê şer yan alîgirê aliyên şerker.

**Encam: kendalê hilweşiyanê ya derfetek bo ji nû ve avabûnê**

Rabûna Şêr, hevsengiya bê ser û ber a hêzê di Rojhilata Navîn de tevlîhev kiriye û êrîşên serkeftî yên Îsrayîlê ku bi alîkariya teknolojiya pêşkevtî ya şer û hêza sayberî û her wiha piştgiriya Rojava meşiyane, di heman demê de ku hevkêşeyên ewlehiyê yên herêmê tevûhev dane, di heman demê de ne kêrhatîbûna pêkhate û jêrxwana bergirî û ewlekariya rejîma Îrane jî kifiş kirin.Di vî şerî de rejîma Îranê heya niha derbeyeke giran ji aliyê leşkerî ve xwariye û şiyana xwe ya serekî di berhingariyê de li dest dayê. Rejîm niha bi qeyranên weke fermandehiya leşkerî, pedafend yan sîstema bergiriyê û ji hemûyan girîngtir qeyrana meşrûiyeta navxweyî di warên siyasî, aborî û civakî de rû bi rû ye valahiya di navbera gel û rejîmê de heta diçe zêdetir dibe. Ev rastiye jî di asta derve de rejîmê li hember gefên bîhanî de lawaz dikê û di hindur de jî bizava sernixûnî û hilweşandina rejîmê pêş dixe.

# Sîyaseta netewî çi ye, naverok û paradîgmaya wê çawa ye?



N. Cano Amedî

Rewşa sîyaseta netewî li Kurdistanê mijareke gelek hestyar e. Kurdistan bi ernîgarîya xwe, bi sosyolojîya xwe, bi nîrxên xwe yên netewî, bi ziman û bawerîyên xwe, di nav çar dewletên cûda de û bi piştgirîya dewletên desthilatdar hatîye perçekirin. Em dikarin bi hêsanî bêjin ku perçeyê pêncemîn jî Kurdên dîaspora û yên Qafqasya jî di nav vê dabeşkirinê de cîh digirin.

Gava ku em qala sîyaseta netewî bikin, divê em vê rastîyê jî li ber çav bigirin.

Pirsgirêka kurd û Kurdistanê ne ya yek perçeyî an yek beşî ye. Pirsgirêkek gelemperî û navneteweyî ye. Li dîaspora û bajarên metrepolên dewletên dagirker, li qafqasya û li her perçeyên Kurdistanê şert û mercên sîyasetê diguhere. Menzîla armanc û hedefên sereke li gorî konjonktora dunyê, li gorî dewletên dagirker diguhere. Lê bele sîyaseta netewî, bi xwendin û kordînasyoneke giştî, dikare weke orkestrayeke netewî tevbigere, aheng û harmonîyeke hevbeş peyda bike û rê li ber destkeftîyên cuda vebike. Ev jî bi desthilatdarîya hişmendîya netewî pêk tê.

Em hemû baş dizanin ku bi giştî, rewşa sîyaseta netewî ya kurd li Kurdistanê di asteke pêşveçûnê de ye. Li her parçeyekî, ji bo bidestxistina mafên neteweyî û xurtkirina yekîtîya kurdî, hewlên cuda têne meşandin. Lêbelê, parçebûna Kurdistanê, destwerdanên hêzên herêmî û navneteweyî û nakokîyên navxweyî yên kurdî hîn jî li pêşiya serkeftina sîyaseteke netewî ya yekgirtî astengiyên girîng in.

Li Kurdistanê, dîroka sîyaseta netewî, dîrokeke dirêj, bi êş û berxwedan e. Ji sedsalan ve Kurd di bin serwerîya împaratorî û dewletên cuda de jiyane û her dem hewl dane ku nasnameya xwe ya neteweyî biparêzin û bigihîjin statûyeke siyasî, netewî, coxrafî.

Em dikarin ji dema serdema mîrektîyan bigirin heta serdema îroyin, di derbarê qonaxên sereke yên dîroka sîyaseta netewî de gelek tiştan bêjin. Lê ji ber ku mijar belav nebe, divê em li ser mijara diyarkirî tevbigerin.

Belê sîyaseta netewî mijareke gelek girîng û berfireh e. Ev mijar di heman deman de tesîrê li ser jîyana mirov û civatê dike. Ji ber wê yeke mirov bixwaze an nexwaze, nikare xwe ji pergala siyasetê dûr bixe. Lewra li welatên bindest yên kolonî, rola sîyaseta netewî, naverok û paradîgmaya sîyasetê diguhere. Armanc û hedefa têkoşîna netewî ya sereke azadî, serxwebûn û serwerîya milet û welat e. Têkoşîna rizgarîya welêt ne bi beşek civatê ve girêdayî ye. Hemû beşên civatê şirîkê vê têkoşînê ne.

Sîyaseta netewî, bi kurtî, ew rêgez (prensip) û armancên sîyasî ne ku ji bo berjewendîyên neteweyekê û welatekî, di çarçoveya dewletê de têne danîn û tê meşandin. Ew hişmendî hewl dide yekîtî, serwerî, ewlehî, refah û pêşketina neteweyekê û welatekî misoger bike.

Em dikarin naveroka sîyaseta netewî bi gelemperî ewha îfade bikin:

Felsefa sîyaseta netewî ew e ku li dijî her cure destwerdanên derve û parçebûna navxweyî, serwerîya neteweyî û niştimanî biparêze. Ev xala herî bingehîn e. Ev helwestek parastina serwerî û yekîtîya axa neteweyî ye. Sîyaseta netewî desthilatdarîya miletê xwe û azadîya welatê xwe ji xwe re dike armanc û hemû şêweyên têkoşînê yên meşrû bi kar tîne. Felsefeya sîyaseta netewî ya dîrokî ew e ku li dijî sîstema dagirkerîyê/mêtîngehkarîyê têbikoşe û ala azadîyê li seranserê welêt hilde jor. Ev jî bi hişmendîya netewî, niştimanî, bi peydekirina rê û rêbazên têkoşîn û berxwedanê pêktê.

Dîsa ji armanca sîyaseta netewî yek jê ew e ku aborîyek bihêz û serbixwe were avakirin ku refahê ji bo hemû welatîyan misoger bike. Ev dikare bi rêya piştgirîya hilberîna navxweyî û navdewletî, bi pêşxistina teknolojîyê û bazirganîyê pêk were ku rê li ber pêşxistina aborîya neteweyî veke.

Armanca sîyaseta netewî yek jê jî xurtkirina ewlehîya neteweyî û azadîya civatê ye. Ev tê wateya parastina welat û welatîyan ji her cûre tehdîdên derve û navxweyî. Ev jî bi rêya azadîya rêxistinbûna sazî û komeleyên demokratik, bi serwêrîya hûqûqeke giştî mumkun e!

Sîyaseta netewî divê hewl bide ku çand û zimanê neteweyî biparêze, pêş bixe û bigihijîne nifşên nû. Ev jî, nasnameya neteweyî û hişmendîya milî xurt dike. Pêşxistina çand û zimanê neteweyî, yek ji pîvanên pêşketina civatê ye. Ziman, di sîyaseta netewî de xwedî rolek girîng û bi bandor e. Ziman stûna diyalog û hişmendîya neteweyî ye.



Tecrube û rûpelên dîrokê nişan dide ku misogerkirina dadwerî û wekhevîya civakî; serwerîya pergala hûqûqê û parastina mafên kollektîf bingeha desthilatdarîya demokratik e. Divê hemû welatî li ber qanûnê wekhev bin û fersendên wekhev ji bo perwerde, kar û xizmetên civakî hebin.

Sîyaseta netewî di heman deman û di têkilîyan de divê berjewendîyên neteweyî li pêş bigire. Parastina berjewendîyên netewî yek ji erkê netewperwerîyê ye.

Dîsa em dizanin ku paradîgma sîyaseta netewî dikare li gorî îdeolojîyên cuda biguhere. Bi reng û naveroka xwe dikare di pêvajoyên cuda de derbas bibe. Lê bi gelemperî, ew li ser van hêmanan disekine:

Sîyaseta netewî li ser bingeha paradîgmaya desthilatdarîyê tevdigere û statuyek milî ji xwe re dike armanc. Ji bo dewleta xwe ava bike li gorî şert û mercên demê hemû şêweyên têkoşînên meşrû, milî esas digire. Siyaseta netewî li hemberî statuya dagirkerî, statuyek serweriya milî dipejirîne û ji bo serkeftinek mîsoger, hewldanên yekrêzîya nav xwe xurtir dike.

Siyaseta netewî ji dîrokê ders digire û li gorî tecrubeyên derbasbûyî stratejîyek netewî, bi destxistina mafên muşterek tevdigere û berjewendîyên netewî li ser hemû berjewendî û nasnamayan re digire. Partî, rêxistin, grûp an tevgerên sîyasî divê xîzmetkarên doza netewî, niştimanî bin, pasevanê berjewendîyên giştî bin.

Sîyaseta netewî serwerîya neteweyî esas digire, strateji, armanc û rêbaza têkoşînê li gorî pêleya daxwazên herî bilind dîyar dike. Hişmendî û bawerîya ku dewlet di nav sînorên xwe de serbixwe ye û tu hêzên derve nikarin destwerdanê bikin esas digire û li gorî pêwîstîyên demê tevdigere.

Dîsa pêwîst e ku berjewendîyên neteweyî, di heman deman de divê li pêşîya berjewendîyên komî û hizbî bin; di pêvajoyên hemû biryarên sîyasî de ev realite divê ji bîr nebe û rê lê neyê asêkirin.

Hewldanên ji bo yekgirtina hemû pêkhateyên neteweyî, divê di bin nasnameyeke hevbeş de yekrêzî û yekîtîya neteweyî esas bigire. Ji bo serkeftina sîyaseta netewî pêdivî bi hevkariya gelek aliyan heye. Ev jî bi rêya hevkarî, tifaq, xebatên hevbeş û bi yekîtîyek netewî, niştimanî pêkane. Lewra doza netewî girêdayî armancên giştî ye, daxwaza azadî û serxwebûna welat, doza hemû pêkhate û beşên civatê ye. Divê rê û rêbazên têkoşînê jî li ser lihevkirin û xebatên hevbeş pêk bê.

Sîyaseta netewî berjewendîyên, hemû dîn, mezheb, zarav, beşên civatê yên miletê Kurd û hemû fikir û sîyasetan himbêz dike.

Herweha sîyaseta netewî divê berjewendîyên hemû gelên din ên li Kurdistanê dijîn jî himbêz bike.

Ango, gava ku em behsa sîyaseta netewî dikin, em behsa parastina berjewendî û mafên miletê Kurd û hemû gelên ku li Kurdistanê dijîn dikin. Netewperwerî û welatperwerî hevdu temam dikin û yek bêyî ya din nabe.

# Ji Çiyayan Ber bi Dîplomasiyê – Destpêka Qonaxeke Nû di Dîroka Neteweya Kurd de



N. Dr . Mecîd Heqî

**Beşa 3**

Li başûrê Kurdistanê, hilweşandina PKKê dikare rê li ber veguherîneke di têkiliyên navxweyî yên Herêma Kurdistanê de veke. Eger hêzên siyasî yên sereke - bi taybetî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) - vê pêşveçûnê wekî derfetek ji bo kêmkirina aloziyan bibînin û balê bikişînin ser pêşkeftina domdar, dibe ku em kêmbûnek di destwerdanên leşkerî yên Tirkiyê û xurtkirina desthilatdariya sivîl de bibînin.

Gotara pêşketina aborî, edaleta civakî û rêveberiya beşdar niha dikare cihê reqabetên partîzanî û zextên herêmî bigire. Başûr xwedî potansiyel e ku bibe navendeke siyasî û referansek dîplomatîk a nû ji bo pêşeroja herêma Kurdî.

Li rojhilatê Kurdistanê, partiya PJAK, wekî yek ji şaxên rewşenbîrî-siyasî yên nêzîkî PKKê, niha bi pêwîstiya ji nû ve pênasekirina mîsyon, stratejî û felsefeya hebûna xwe re rû bi rû ye. Rastîyên civakî, siyasî û çandî yên rojhilatê Kurdistan û Îranê hewce dikin ku ev partî li gorî pêdiviyên herêmî û dînamîkên navxweyî yên vê erdnîgarîyê ji nû ve were avakirin, ne ku şêwazên hawirdekirî dubare bike.

Di heman demê de, ev serdem dikare ji bo hêzên siyasî û sivîl ên rojhilatê Kurdistanê derfeteke zêrîn be da ku rê li ber yekîtiyeke nû ya neteweyî vekin da ku îdealên neteweya Kurd li Îranê bişopînin, bêyî bandora aktorên herêmî û îdeolojiyên ferzkirî. Yekîtîyek li ser demokrasî, wekhevî û mafê çarenûsî ava bûye.

PKK ne tenê rêxistineke gerîla bû, lê di heman demê de stûna siyaseta rizgariya Kurd li bakurê Kurdistanê bû. Di nebûna wê de, du rêbaz dikarin derkevin holê: ya yekem, kaosa rêxistinî û valahiyek desthilatdariyê. Duyem, avakirina modelek beşdar û encumenî ya temsîlkirina gel li ser bingeha pirrengî, şefafî û demokrasiya beşdar.

Eger tevgerên nû dixwazin rewatiya gel bi dest bixin, divê ew ji navendîbûn, avahiyên vertîkal û serokatiya karîzmatîk dûr bikevin û xwe bispêrin avahiyên torî, beşdar û hesabgir.

Yek ji stûnên sereke yên teorîk û pratîkî yên PKKê tevgera azadiya jinê bû. Jinên di nav refên PKKê de ne tenê şervan bûn, di heman demê de teorîsyen, fermandar û rêber jî bûn. Têgehên wekî “jina azad, civaka azad” û “bêseksuelkirina desthilatdariyê” şoreşek kûr a rewşenbîrî di civaka baviksalar a Rojhilata Navîn de afirandin.

Niha, hebûna meclîsên jinan, rêxistinên wekî YPJ û TAJÊ, û perwerdehiya li ser bingeha jinan li kamp û bajaran rastî ceribandinek mezin hatiye. Hîn nayê zanîn ka gelo ev sazî dikarin xwe ji nû ve ava bikin û bêyî piştgiriya PKKê rêya xwe bidomînin.

Diyasporaya Kurd li Ewropayê, ku beşek mezin ji wê li ser bingeha torên PKKê hatibû organîzekirin, niha bi pêwîstiya ji nû ve pênasekirina xwe re rû bi rû ye. Nifşê duyem û sêyem ê koçberên Kurd, bi nasnameya xwe ya tevlihev, perwerdehiya Rojavayî û nêzîkatiya xwe ya mafên mirovan, xwedî potansiyela berfirehkirina dîplomasiya gelan di asta parlamentoyên Ewropî, dadgehên navneteweyî û saziyên mafên mirovan de ne.

Ev dîyaspora, bi dûrketina xwe ji şêweyên rêxistinî yên klasîk, dikare bibe yek ji hêzên nerm ên herî girîng di stratejiya piştî-PKKê de.

Hilweşandina PKKê ne tenê veguherînek rêxistinî an taktîkî ye; Belê, ew xalek werçerxê ye di dîroka tevgera rizgariya neteweyî ya Kurd de ku dikare pêşeroja têkoşînê di rêyên nû û pir-qatî de şekil bide. Ev veguhêz divê ne bi fikar, lê bi têgihîştin, realîzma siyasî û îdealîzma civakî were fêmkirin.

Ezmûna dîrokî ya neteweya Kurd, bi taybetî li Bakûra Kurdistanê, nîşan daye ku her gava ku tevgera berxwedanê bi awayekî yekalî paşve gav avêtiye, rejîma serdest ev yek wekî nîşana qelsiyê dîtiye û êrîşên xwe yên tepeserkirinê dijwartir kiriye. Bêyî parastin û saziyên sivîl ên alternatîf, hilweşandina PKKê metirsiya dubarekirina dehsalên tarî yên salên 1990î tîne holê. Divê tevgera rizgariyê, vê carê bi aqilê stratejîk, rê li ber hevsengiyek nû ya hêzê -her çend ne leşkerî be jî- li dijî otorîterîzmê veke.

Di nebûna hêzek hegemonîk a şoreşger de, hêzên muhafezekar û paşverû yên ku piştgirîya partîya desthilatdar a Tirkiyeyê dikin an jî di bin



bandora Komara Îslamî de ne, dikarin hewl bidin ku gotara têkoşîna PKKê kêm bikin û wê bi guhertoyên çewt û bênavber biguherînin. Tevgera rizgariyê divê bi parastina afirîner a van têgehan rê li ber desteserkirina têgehên wekî “mafê çarenûsî”, “azadî û wekhevî” û “edaleta civakî” bigire.

Ezmûna dîrokî nîşan dide ku jihevqetîna îdeolojîk û rêxistinî yek ji encamên herî xeternak ên veguherîna ji rêxistineke navendî ber bi toreke piralî ye. Tevgera rizgariyê divê bi avakirina Konseya Bilind a Berxwedana Kurd an jî hevwateya wê, di navbera tevgerên cihêreng ên gelê Kurd de ji bo hevrêzî, diyaloga stratejîk û hevgirtina navxweyî navokek biafirîne.

Tevgera rizgariyê divê ber bi afirandina avahiyên nû yên nûjen, xwerêveberiya herêmî û seferberiya sivîl û dîyasporayê ve biçe, li şûna ku tenê xwe bispêre formên leşkerî. Rêxistinkirin li dora torên civakên rêxistinkirî, sendîka û parlementoyên herêmî dikare ji bo qonaxa nû alternatîfek berxwedêr, beşdar û pîvanbar be.

Gelê Kurd îro ne tenê neteweyek bindest e, lê di heman demê de beşek ji eniya gerdûnî ya ji bo edaleta avhewayê, mafên jinan, dij-nijadperestiyê û azadiya medyayê ye. Tevgera rizgariyê divê bi rêya vê yekê, bi kirina pirsgirêka Kurd beşek ji fikarên cîhanî, xwe di navenda têkoşînên cîhanî yên ji bo demokrasî û edaletê de bi cih bike.

Diyasporaya Kurd, bi taybetî li Ewropayê, niha xwedî potansiyel e ku bibe baskê dîplomatîk û medyayî yê tevgera rizgariyê. Divê tevger plansaziya rêxistina nû ya nifşên duyem û sêyem ên dîasporayê bixe rojevê.

Ji perspektîfa tevgera rizgariyê ve, divê hilweşandina PKK-ê wekî dawiya beşek ji têkoşînê û destpêka beşek nû ya ji nû ve pênasekirina têkoşînê were hesibandin. Ev kêliyek dîrokî ye ku divê desthilatdarî ji çiyê derbasî encumenê, ji gerîla derbasî sivîlan, ji tekparêziyê derbasî şirîkatiyê bibe.

Ev guhertin di heman demê de bi pêşketinên girîng ên jeopolîtîk re jî hevdem bûye: hilweşîna eksena otorîter a Tehran-Şamê, eşkerekirina nakokiyên navxweyî yên polîtîkayên nijadperest ên hikûmeta Tirkiyeyê, hevgirtina berjewendiyên Rojavayî bi daxwazên gelê Kurd re, û navneteweyîkirina pirsgirêka Kurd wekî yek ji ceribandinên girîng ên demokrasiya cîhanî.

Lê aştî ne tenê nebûna şer e. Aştiyeke mayînde li bakurê Kurdistanê reformên bingehîn ên destûra bingehîn a Tirkiyeyê, naskirina cihêrengiya neteweyî li Tirkiyeyê, perwerdehiya bi zimanê dayikê, edaleta veguhêz û misogerkirina mafê çarenûsî yê gelê Kurd hewce dike.

Divê mîrateya PKKê bi awayekî afirîner di avahiyên nû, rêxistin û partiyên siyasî yên gelêrî yên li bakurê Kurdistanê, saziyên jinan, zanîngehên gelêrî, medyaya azad û dîplomasiya dîasporayê de were domandin. Ev berpirsiyarî ne tenê li ser nifşên nû yên Kurd e, lê di heman demê de li ser hemû tevgerên pêşverû, hêzên demokratîk ên herêmê û raya giştî ya cîhanî ye.

Em li ber deriyê sezoneke nû ne. Beşek ku pêşeroja wê bi wêrekiya me ya di hizirkirina nû, avakirina nû û parastina azadiyê bi awayekî afirîner ve girêdayî ye.

# Şerê di navbera rêjîma Îranê û Îsraîlê de û armancên me Kurdan



N. Hesen Mukerem

Di meh û salên dawî de, alozî û têkçûn di navbera rejîma bi nav Îslamî ya Îranê û Îsraîlê de gihîştiye asteke bê mînak.

Ev şer, ku gelek caran şerê bedel û hin caran jî rasteras bûye, ne tenê qada Rojhilata Navînê, belku jiyan û pêşeroja milyonan mirovan tê de hatiye wêran kirin.

Di vê rewşê de, gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê û parçên din, her gav di bin zordestî, û nedadatiya dîrokî de maye.

Lê ma dibe ku hêvî bûn li ser hêzên derveyî, bi taybetî Îsraîl, dikare rêya bi destveanînana maf û azadiyên kurdan veke?

Ezimûnên dîrokî nîşan didin ku mezin hêzên cîhanî û herêmî, wek Îsraîl, Amerîka, Rûsya û welatên Ewrûpayê, her gav gelên bindest wek kurdan û belûçan û ...hewd, wek amûra givaş û karta bazirganî li dijî beranberê xwe bikaranîn.

Her dem ku balê wan hêzan li ser xwe bibe, piştgiriya demdemî û kêm ji tevgera azadiyê tê kirin, lê di demekê ku rewş diguhere an jî balê wan tê dayîn, ev piştgiriya tê rawestandin an jî bi zirarê wan gelan tê qedandin.

Mînakên rûmetî dikarin di ezimûnên kurdan li Iraq û Sûriyê bibînin yan Kurdistana Sor û Soviyetê ji ber bejewendiyên xwe firot; li wir piştgiriya




derveyî di demên girîng de ne têkildar bû an jî tevahî hatibû berdan.

Ji ber vê yekê, hêvî bûn tenê li ser hêzên derveyî, ne tenê piştrastiyek nîne bo bidestveanîna maf û azadiyên kurdan, lê dikare wan jî bibe amûr di lîstika hêzên mezintir de.
Yekîtîya navxweyî ya kurdan hêzdar bibe, ew qas hêz û mafê wan ji bo xwestina piştgiriya navneteweyî û parastina mafên xwe di danûstandanên herêmî û navneteweyî de zêde dibe.
Ezimûnên dîrokî nîşan didin ku hêvîdar bûn tenê li ser piştgiriya derveyî bê yekîtîya navxweyî, ne tenê piştrastiyek nîne bo bidestveanîna mafên kurdan, belku dikare wan bike amûrek di lîstika hêzên mezintir de.

**Yekîtîya navxweyî bingeh û esasa bidestveanîna maf û azadiyên kurdan e, û bê wê, piştgiriya navneteweyî jî tenê dikare bandorek kêm hebe.**

Di heman demê, daxwaz û piştgiriya civaka navneteweyî dikare rolê pêşixistinekê bidê, bi merca ku kurd bi yekîtî û rêxistina navxweya xwe amade bikin da ku ji firsetên navneteweyî baş bikar bînin.

Bi bîr anîna rewşa nexweş û ihtimala ketin an lawazbûna rejîma dîktator û cînayêtkar a Îranê, Kurdên Rojhilatê Kurdistanê li Îranê divê xwe bo rewşa nû amade bikin.

Ev amadekarî serî de, hewcehî bi hebûna yekîtî û hevraya navxweyî heye.


Ezimûn nîşan didin ku tenê bi xebata gelê xwe, rêxistinî ya hêzdar, û avakirina hevpeyman di nav kom, partî û rêxistinên cuda yên li Rojhilatê Kurdistanê de, dikare di demên dîrokî de ji firsendan baş bikar bîne û ji dubarebûna tirajîdiyên berê xilas bibe.

**Herwesa, kurd li Rohilatê Kurdistanê divê bernameyek vekirî û pratîkî bo rêveberiya herêmên xwe, ewlehiyê, rêveberiya çavkaniyan û avakirina çarçoveyên dîmokratîk û bersivdar hebe, da ku di rewşa guherînê de bi hêz û rewatiyek tam, ji maf û azadiyên xwe berevaniyê bikin.**

**Di dawiyê de**

Di encamê de, kurdên li Rojhilatê Kurdistanê li Îranê divê tenê hêvî li ser hêz û yêkitiya xwe hebin û li wê derfeta ku ji aliyê Îsraîl û Amerîka ve jî rêjîma Îranê kevtiye jêr givaşê, hewceye mifahê bi qazancê xwe û armancên dîrokiye xwe wergire.

Tenê rêya azadiyê û girtina mafên kurdan, yekîtî, hevrayî û amadekarî bo rêveberiya xwe ye.
Kurdistana azad, ne bi promesên vala yên hêzên derveyî, belku dê bi îrade û xebata gelê kurd xwe dê were misoger kirin.



## Nerîna



**“Donald Trump”:**

**“Egera herifîna rêjîma islamiya Îranê zêde ye”**



**“ Yisrael Katz”:**

**“Divê em êrîşî hemû sembolên rejîmê û mekanîzmayên wê yên tepeserkirina gel bikin, wek Besîc (paramîlîter) û bingeha wê ya desthilatdariyê wek Spaha Pasdaran”**



**“Eyal Zamir ”:**

**“Ji bo rakirina gefên li ser asta niha û li dijî dijminekî wisa, amadekariyeke demdirêj hewce ye”**



**“Receb Teyb Erdogan” :**

**“ Berî ku felaketeke mezin pêk were destên xwe ji ser tetîkan rakin”**

# Hevdem ligel êrîşên Îsraîlê, darvekirinên siyasî li Îranê zêde dibin



**N. Eskender Ceiferî**



Artêşa Îsraîlê ji bo mana xwe, dixwaze metirsî û gefên ku li ser wê hene, nehêle.
Lewma êrîşî ser rêjîma Îranê kir da ku rê nede ev rêjîm bibe xwediyê bombeya etomê. Îran jî xelkê sivîl û girtiyan ji xwe re dike mertal.

Roja 16ê Hezîrana 2025an, hevdem digel berdewamiya pevçûna leşkerî ya di navbera rêjîma Îranê û Artêşa Îsraîlê de, Ismaîl Fikrî 30 salî yê xelkê bajarê Tehranê li girtîgeha Qizilhisar a nêzîkî bajarê Kerecê bi awayekî veşartî ji aliyê rêjîma Îranê ve hate darvekirin.

Ew bi sîxurtiya ji bo welatê Îsraîlê hatibû tometbarkirin - sûcdariyek ku li gorî rêxistinên mafên mirovan ên navnetewî, her ku diçe ji aliyê rêjîma Îranê ve wekî amûrek siyasî tê bikaranîn.

Ne malbata wî û ne jî parêzerê wî ji berê ve nehatibûn agahdarkirin û lewma wî nekarî ji bo cara dawiyê malbata xwe bibîne.

Standina sizayê darvekirinê bi awayekî veşartî pêk hat. Ku ev jî dîsa rexneyên mezin li ser pêkhateya dadwerî ya rêjîma Îranê derdixe holê. Îsmaîl Fikrî sala 2022an hate girtin.

Piştî du salan ji girtîgeha takekesî û lêpirsînan, sala 2024an ji aliyê Dadgeha rêjîma Îranê ve bi rêveberiya Dadwer Îman Afşarî cezayê darvekirinê bi ser de hate birîn.

Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê û saziya mafên mirovan a Hengawê beriya niha hişdarî dabûn ku dibe ku ew bê darvekirin.

Li gorî van saziyan, ev yek nîşan dide ku zextên rêjîmê bi zanebûn zêde dibin, nemaze di demên krîzên siyaseta derve de.

Çar girtiyên siyasî yên Kurd bi navên Wefa Hinare, Aram Omerî, Rehman Pirhazo û Nesîm Nemazî jî beriya niha li girtîgeha Urmiyê bi tometa sîxuriya ji bo Îsraîlê hatibûn darvekirin.

Li gorî Hengaw, di roja 30 yê heyva borî de herî kêm 12 kes - di nav de 7 welatiyên Kurd - bi tometa sîxuriya ji bo Îsraîlê ji aliyê rêjîma Îranê ve hatine darvekirin.

Darizandin bi gelemperî bi mikurhatina bi zorê, îşkence û nebûna zelalbûna dosyeyê dihatin xuyakirin.

Kurd, Bahaî û çalakvanên civaka sivîl bi taybetî rastî wan binpêkariyan tên.

Li gor saziyên mafên mirovan, 5 girtiyên Kurd bi navên Azad Şocaî, Idrîs Elî, Şahîn Wesaf, Nasir Bekirzade, û Resûl Ehmed Mihemed di bin metirsiya darvekirinê de ne.

Girtiyê siyasî bi nave Mihemededîn Mehdavî Şayiste, ku ew jî li Qizilhisarê girtî ye, sizayê darvekirinê yê wî hatiye piştrastkirin.

Tê gotin ku mikurhatinên wî di bin givaşên giran ên psîkolojîk de hatine wergirtin.

Lêkolînerê Îranî-Swêdî bi navê Ehmedreza Celalî tevî nerazîbûnên navnetewî lê heya niha di girtîgehê de ye û ew jî bi darvekirinê hatiye sizakirin.

Rewşa girtîgehan hevdem digel berdewiya şer xirabtir dibe.

Li Kirmaşanê, hêzên ewlehiyê bi tundî bersiva nerizayetiya li Girtîgeha Sêzilawa dan.

Piştî êrîşên Îsraîlê yên li nêzî girtîgehê, girtiyan xwestibûn rêjîma Îranê wan bibe cihekî ewleh.

Tê gotin ku pitir ji 15 girtî hatine kuştin û zêdetirî 30 kes jî birîndar bûne.

Li Girtîgeha Êvînê, girtiya siyasî bi nave Mahvaş Seedal di nameyekê de şert û mercên xembar wiha vegotin: “Em di navbera tirsa bombeyan û xencerên hêzên Îranê de dijîn... Ewlehî peyvek vala ye. Rêjîma Îranê jî me naveguhêze.”

Girtîgeha Seqizê jî ji aliyê leşkerên Îranê ve hatiye dorpêçkirin.

Girtî daxwaza veguhestin ji bo cihên ewleh dikin. Lê heya niha rêjîmê ew neveguhêstine.

Di vê navberê de, li gelek bajaran - di nav de Tehran, Urmiye û Sine kesên ku ji kampên madeyên hişber reviyane, hatine girtin û ji bo cihên nediyar hatine veguhestin.


Herwisa dadweriya Îranê jî çavdêriya xwe li ser xelkê zêde kiriye:
bi peyamên nivîskî hişyarî hatiye dayîn ku kêfxweşiya li hember êrîşên Îsraîlê an jî şîroveyên bi vî rengî dê cezayê ji bo xelkê li pey xwe ve bînin.

Çavdêr vê yekê wekî hewldanek din ji bo kontrolkirina raya giştî dibînin.

# Awirek bi pirtûka “serûçavên dagîrker, serûşavên dagîrkirî” a nivîsa “Albert Memmi”



N. Bêhzad Qadirî
W. Bêhzad Simko




**Destpêk**

Pirtûka ““serûçavên dagîrker, serûşavên dagîrkirî” li sala 1957 a Zayînî, ji alliyê “Albert Memmi” ve hatiye nivîsandin û li sala 2025 a Zayînî de ji aliyê “Fuwad Kerîmî ve ji Zimanê Firansewî ve bo zimanê Kurdî hatiye wergêrandin û li Herêma Kurdistanê de jî hatiye çapkirin û weşandinê. Ev pirtûka li wêjeya “Postcolonialism”ê de berhemek bingehîn e û bihevxistina dîtingehên filosofî, civaknasî û hindirnasiyê, li pêwendiya navbera dagîrker û dagîrbûyî, şirove dike. Berwajiyê pitira wan şirovekarên ku koloniyalîsmê wek diyardeyek tevav siyasî an aborî dibînin, “Albert Memmi”, koloniyalîsmê wek ceribandineke hundirî û hundire-civakî ya du alî dibîne: ceribandinek ku hem dagîrker û hem dagîrkirî, rastî “qeyrana nasname, hevrikî û jixwebiyanîbûn”ê tîne.

**Pêkhateya pirtûkê**

Ev Pirtûk ji du beşên bingehîn pêk hatiye: 1- serûçavên dagîrker 2- serûçavên dagîbûyî.

“Albert Memmi” li wan 2 beşan de dide xuya ku çawa koloniyalîzm, sîstemek hundirî û îdeolojîkiya aloz e ku li ser binyata duyaneya dijayetî û pêkhateya pilkebend, hem zalker mijûlê rewatîdan bi hejmoniya xwe dike û hem jêrdest neçar bi xwebiçûkdîtinê dike.

**Beşa yekem: Koloniyalîst û qeyrana reftar-hundiriya hejmûnê**

“Albert Memmi”, koloniyalîstê neku her wek fakterek aborî an serbazî, belku wek (sûje) an sobektîvekî hundirî ku mijûlê hevrikiya navxweyiyan e, dide xuya. Bo vê ku serdestî û hejmoniya xwe bidomîne, hewcehî bi guherandina rûkê rast ê dagîrkirî heye.

- Hêcetanîn bo serdestiyê; Koloniyalîst bi mijarên wek “şaristanîkirin, rizgarkirin û daba pêşkevtinê” neçar e ku xwe bi xwdî exlaq bide nîşandan.

- Sivikatîkirin bi yê din; dagîrker bo parastina serdestiya xwe, dibe wêneyeke paremayî li dagîrbûyî çê bike. Bi gotina “Memmi” dagîrker sivikatiyê bi dagîrkirî dike bo vê ku bikare xwe bi mezin bide nîşandan.

- Dûrketin ji rastiya exlaqî, heta koloniyalîsma bi armanc baş jî li dawiyê de dibe berhemhênerê serdestiyê, çimkî pêkhateya koloniyalîzmê, her armanceke exlaqî, pesîv dike.

Li wir de koloniyalîst tûşî curek li dunasnametiyê dibe: “Ji aliyek bala wî bo vê heye ku bawerî bi mirovahiyê hebe, ji aliyê din ve û li kiryar û piraktîkê de hewara xwe bo tundîtîjî û cudatîdanîna sîstematîk ve dibe, ew rewş dibe sedema hilveşîna wijdanê li koloniyalîst de.

**Beşa duyem: dagîrkirî û hundirnasiya xwebiçîkdîtin û jixwebiyanîbûn**

“Albert Memmi” li beşa duyê de karlêkeriyaên hundirî û nasnameyita kolonoiyalîzmê li ser dagîrkirî, rohn û şirove dike. Bi bawera wî, koloniyalîst bi tenê bi derba çek serdest nîne, belku karlêkeriyên wî li ser hizir û hundirê takê dagîrkirî ye, dixwaze takê dagîrkirî bike koleyê xwe.

Navekîkirin an etomîzekirina sivikatî û xwebiçûkdîtin; Piştî dubarekirinan û rûberûbûna berdewam digel morkên tevlî pêkenîn û sivikatîker, hêdî hêdî dagîrbûyî vê dîtingehê li derheq xwe ve etomîze û navikî dike. Ev yeka jî dibe sedema kerbjixwebûn, şik û gumal lixwekirin û jixwebiyanîbûnê.

- Du alîketina li nav hundir; Dagîrbûyî an dagîrkirî bi awayekî hevdem hem sivikatî bi koloniyalîst dike û ecîbgirtiyê wî dibe. Ji aliyek dixwazin bêne azadkirin, ji aliyê din ve dixwazin wek koloniyalîst bin. Ev dijheviya, curek aloziya hundirî li takê dagîrkirî de berhem tîne.

- Bal bo asimîlebûnê, hinek ji koloniyan hewlê didin ku bi destberdan ji ziman, ol û nerîtan û erêkirina kultûra koloniyalîst, xwe bêxin nav pêkhateya dewsthilatê. Lê “Albert Memmi” dide nîşandan ku ew prose, hertim tûşî şikestê dibe, çimkî koloniyalîst ti car wî wek “Xwe” qebûl nake.

**Koloniyalîzm wek pêywendiyeke netendirûst**

Yek ji çemkên bingehîn ên vê pirtûkê, dîtingeha koloniyalîzmê wek pêwendiyek hundirî ya netendirust e. koloniyalîst bo vê ku nasnameya serdestbûna xwe biparêze, hewcehî bi sivikatîkirin bi “yê din” heye. Herwisa dagîrkirî bo peydakirina wateya wê ya hebûna xwe, tûşî dijayetiya li navbera “redkirin û rakêşanê” dibe.

**Bandor û pêgeha pirtûkê li wêjmana “Postcolonialism”ê**


Pirtîka “Albert Memmi” bi taybet li kêlega berhemên “Frantz Fanon”(Pêstê Reş, Dcemamika Sipî û Dujehiyên Ser Erdê), rolek girîng li pêkhateya “Postcolonialism”ê de hebûye. Herwisa dîtingeha hundirî ya wî, binyata şirovekariyan li berhemên “Edward Said” bûye.

Herwisa berhemên “Albert Memmi” karlêkeriyek gelek zaf li ser têgihîştin ji “Neocoloniyalism”, koloniyalîsma Kultûrî û heta hundirnasiya bi kom a civakên piştî koloniyalîzmê yên wek li ser babetên wek qeyrana nasnameya netewî, berxwedana kultûrî û hewldan bo avakirina nasnameya resen hebûye.

**Encam**

Pirtrûka “Serûçavên dagîrker, serûçavên dagîrkirî” ya “Albert Memmi”, bi biukaranîna dîtingehek hundirî û civaknasiyê, digel çînên kûr û nedîtiyên pêlwendiya koloniyalîzmê bi me dide nasandin. Ev berhema vê dide xuya ku koloniyalîzm bi tenê pirsek serbazî an siyasî nîne, belku pêkhateya hundirî û kultûrî ye ku çarçoveyê bo hizrînan dide xuya û nasnameyan ava dike û bi rêya ziman, perwerde, ragihandin, û nirx û bihayan, derfetê bo berhemanîna baladestiyê çê dike. Xwendina vê pirtûkê, bi taybet li civakên piştî koloniyalîzê de bo şirovekirina mîrata hundirî ya koloniyalîzmê û rizgarbûn ji vê, hewcehiyek rohn û eşkere ye.

# Bersiv li ser paşguhxistina Doza Kurdî li Sûriyê



N. Ebdulezîz Qasim




Ji demê hatina Ehmed El-Şerih li ser desthilatê li Sûriyê, piştî hilweşîna rejîma Esed di 8ê çileya sala borî de û heta îro, rewş û rastiya Sûriyê ya civakî, cugrafî, siyasî, etnîkî û olî tê paşguh xistin, û bi taybetî ku hebûna gelê Kurd bi carekî tê paşguh xistin, her bigire ji lidarxistina Kongirê diyaloga nîştimanî û piştre damezrandina komîteya destûrî, heta bigehê avakirina hikûmetê û damezrandina saziyên desthilatdariyê û artêş û asayîşê heta vê dawiyê bi destnîşankirina komîteya helbijartina Perelman, ku heta îro ev rêveberiya mikur tê li ser heman siyasetên başguhxistina hebûna gelê Kurd, zêdebarî dabeşkirina post û pileyên bilind di artêş û hikumetê de li ser hindek kesên tawanbar bi pêkanîna komkujiya li dijî Kurd li Efrîn û Serêkaniyê û Girê Spî ...

Piştî lidarxistina Konferansê Qamişlo di 26ê Nîsana borî de, hêviyên geş li rex cemawerê kurd peyda bû, lê heta niha hîç karek cidî nebûye li ser cêbicêkirina xalên Konfrans, bi tenê ku bi awayekî hizbî komîteyek ya hevbeş jibo danûstandinê hate pêkanîn, lê wisa diyar e ku heta niha rêveberiya Ehmed El-Şerih amade nîne bo pêwaziya şanda Konferansê Qamişlo ya hevbeş û hêjî mikure li ser redkirina Konferansê Qamişlo û bi berovajî ji Rêkeftina 10ê Adarê ya di navbera Ehmed El-Şerih û Mezlûm Ebdî de dibînê ku di wê rêkeftinnameyê de hîç danpêdanek bi mafên neteweyî yên gelê Kurd nîne.

Mixabin; li beramber vê paşguhxistina bi enqest ya rêveberiya demkî ya Sûriyê û siyaseta wê ya şofînizm ligel daxwaz û mafên Gelê Kurd, ku ji aliyê piraniya partiyên kurdî hîç karvedanek yan bersiv û bertekek cidî nayê dîtin, herwiha metirsiyek mezin heye ku destberdarî jî ji mafên neteweyî yên kurdî bibe, ku tenê razî bibin bi hindek mafên erzan, nemaze ku di kanalên ragihandin û media kurdî de rêklam û bangeşe bo Ehmed El-Şerih tê kirin?!.

Li gorî pêşhat û bûyerên van çend heyvên borî ji desthatdariya Ehmed El-Şerih wisa diyar dibê ku wî hîç niyazek baş li hemberî gelê Kurd û çareserkirina pirsa kurdî nîne, nemaze ku bi carekî daxwaza federaliyê (nenavendiyê) red dike û bi awayekî vekirî kurdan bi parçekirina Sûriyê tohmetbar dike, lewra pêdivî heye ku li rex partiyên kurdî alternativek hebê û bi ciddî hewl bidin ji bo misogerkirina mafên neteweyî yên Gelê Kurd li ser bingehê Konferansê Qamişlo.

Wisa diyar e ku hikumeta Elşerih dê berdewam be li ser paşguhxistina mafên neteweyî yên Gelê Kurd û goman heye ku dê pêşwaziya şanda kurdî ya hevbeş neke, lê hevdem nabe ku siyasetmedarên kurd xwe qels û lawaz bikin li hember desteke Ehmed Elşerih ya berdewam li ser heman hizr û zihniyeta şofînizm û nijadperistî û serederiya yekalî digel rewşa Sûriyê, ku helbet ev yek dê bibe jêder bo zêdebûna qeyran û pirsgirêkan li Sûriyê, herwiha wekî tê dîtin ku pêdagiriya vê hikumetê li ser sîstemê desthilata navend tê bi wateya berdewamiya hikumraniya neteweya ereb li ser tevaya Sûriyê, dê ev yek bibe sedemê peydabûna trajediyên nû û dubarebûna stem û zordestiyê û komkujiyan li dijî Kurd, Kirstiyan, Durzî û Elewiyan, nemaze ku ji aliyê Amerîka û dewletên Erebî ve bi awayekî berçav hatiye qebûlkirin.

Lê wekî xuyaye ku Israel wekî dewleteke zilhêz li Rojhilata Navîn bi hîç awayekî careke dîtir rewşa siyasî ya navçeyê û heta nexşeya cugrafî jî ya li pêş 7ê Oktobera 2023an qebûl nakê, lewra pêdiviya hêzên kurdî bi dîtina kanalên diblomasî ligel Israel heye û pêdiviya siyastmedar û rewşenbîr û berpirsyarên partiyên kurdan bi xwendin û nêrînek siyasî nû heye û li gorî şert û mercên nû divê Tevgera Kurdî xwe bo guherinên mezin amade bikê, nemaze ku rewşa niha ya navçeyê bi awayekî berçav û bineretî li gorî berjewndiya Israel di guhertinê de ye û rewşeke nû bilez peyda dibe û di demekî nêzîk de dê rewşeke geopolitik ya nû bihête dîtin û heta radeyekî dibe ku sînorên navdewletî û nexşeya cugrafî ya navçeyê jî bihête guhertin, û di vê çarçoveyê de û li gorî rewşa nû wisa xuya dibe ku dê bi hîç şêweyî Sûriyek navendî, tak netew tak ol û mezheb nehête qebûlkirin, û divê berpirsên partiyên kurdî rewşa paşguhxistinê qebûl nekin û li hember hewldanên hikumeta Elşerih bê bersiv nemînin û bi carekî siyaseta paşguhxistina mafên Gelê Kurd bi dawî bikin.



# Çawa Cîhan Bê guherîn?



**N. Vênûs Fayîq**
**W. Hesen Mukerem**



"Dolores Huerta" Dibêje: "Her êliyek şansek e bo xwe guherandinê, her mirovek hêzek e bo guherandin, her deqîqeyek derfetek e bo guherandinê."

Guherandina cîhan xewna mezin a me ye. Mebest li guherandina cîhanê, ew coğrafyaya piçûk e ku em di nav de dijîn, "em" jî, wek mirov divê me bawerî bi guherandinê hebe. Ev girêdayî têgihiştina me ye, bandora me li ser dewer û derdora xwe, û girêdana me bi her tişt û her kesekê ye. Guherandina cîhan ji nav xwe dest pê dike, ji ser xwe dest pê dike, her kes xwe biguherîne, di cihekê de tiştek di derdora xwe de diguherîne.

Guherandin hewce ye bi têgihiştina cîhana kevn û derbasbûyî, û dîtingeha nû ya cîhanê li derveyê xwe be. Pirsa sereke ev e: Kî divê cîhanê biguherîne? Karl Marx gotibû: "Feylesofan hewl dan ku cîhanê şirove bikin, di demekê de ku cîhanê hewce ye ku biguherînê heye."

Gelek kes guherandin weke karê xwe nizanin, û baweriya wan ev e ku guherandin karê desthilatdarên dewletî, partî, olî anî fikrî ye. Lê em wekî mirov divê bi pratîk biguherînin û çavê xwe li ber dawetê bixin, ne li derveyê dîrokê bimînin.

Di welatê me de jî ezmûn nîşan didin ku guherandin ne bi dîn, ne bi partî, ne bi desthilata hukûmetê tê xebitandin.

Bo ku em cîhanê fêm bikin, divê em wan rastiyên piçûk, her roj bibînin û fêm bikin, bo ku bizanin ji ku derê dest bi guherandin bikin. karesata mezin e ku em rastiya cîhanê fêm nakin, an jî em tenê axavtina guherandinê bibêjin û li kesên din daxwaz dikin ku biguherînin, xwe jî li cihekê qefil dikin.

Steve Jobs guherandina cîhanê bi awayekî hêsan şirove kiriye: "Gelek girîng nîne ku ez zengînterîn mirov bim, girîng ev e ku ez êvaran ku ser nivînê dimeşim, hest bikim ku tiştek bihêrs bûm û encam da."

Guherandin bawer û prensîp e; mirov, şêwaza bîrkirinê, dîtina cîhanê û têgihiştinê li jiyan û rûmeta mirovî ne diguherînin. Heta ku hewl bidin bo guherandinê, tenê diaxvin û pozîsyonê ramanan didin, lê nikarin wê sîstemê biguherînin ku dilê wan nîne û elqeya wan tê de nîne.

Axavtin niha li ser guherandina sîstemeke jiyanê ye ku hatiye dayîn, tevahî sîstema axlaqî ya civakî û rêveberiya civakî.

Li vir, mirov hewl dide bo guherandinê, û grûp, civak û partî jî axatina guherandin dikin, lê kî ye ku divê ev guherandin bi rastî bê lidarxistin? Pirsa sereke ev e: me gelek kesayetî û rewşenbîr hene ku ev rastî fêm kirine, lê hêza guherandina bingehîn tunînin, çimkî ev bingehên, ol, an partî, an desthilata dewletî ne.

Di dawiyê de, em axatina bi rastî û bi kiryarê hev re girê didin. Li ser erdê rastî du qism hene: Ew partiyên ku xwe di xaneya elmî de girtine, û ew kesn ku xwe wekî arasteya olî nîşan dikin. Her du jî tenê axavtina bê kiryar a guherandin dibêjin.

Yekem gav bo guherandin ew axavtina ye ku hukmê jiyanê dide, rast û şaş û heram û helal diyar dike, axatin partiyan an oliyan.

Îslama siyasî ya tundrew gihiştiye wê asteyê ku hewce ye vegere û axavtina olî ya bingehîn bike. Mebesta min ji axatina Îslama tundrew xwendina ayetên Qur'anê ye, dûr ji asta dîrokî û di nav çarçoveya ku axavtin tê de hatiye, û têkildana wê bi riha demê.

Li dijî wan partiyan jî hewce ye ku vegerin û xwe nû bikin, lê ev qet bi xwe nabe, tenê bi mirov û hişê mirov tê, ne bi desthilatek din.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê sizaya girtîgehê bi ser çalakvaneka medenî ya bajarê Dêwulanê de sepand

Dadgeha rêjîmê sizaya girtîgehê bi ser “Sohêyla Motaî”, yek ji binçavkiriyên tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê û çalakvana medenî ya bajarê Dêwulanê de sepand.

Pêka rapora Hengawê, ji aliyê taya 102 dadgeha sizakirin 2 ya rêjîmê li bajarê Dêwulanê, bi tohmeta “propaganda bo girûp û rêkxiravên dijberî rêjîmê” 3 heyv girtîgeh û 3 sal girtîgeha ragirtî bi ser “Sohîyla Motaî” çalakvana warê jinan û yek ji binçavkiriyên tevgera “Jin Jiyan Azadî” û yek ji girtiyên rêûresma “8ê Mars”ê ya sala 1403 a Rojî de sepand.

Ev çalakvana medenî, li 3ê Cozerdana îsal bo vê dadgeha rêjîmê hatibû banghêjkirin lê ji mafê hebûna parêzer li dadgehêkirinê de hatibû bêparkirin.

Sohêyla Motaî li 20ê Reşemeya 1403 a Rojî, ji aliyê hêzên hov ên îtilaat rêjîmê li bajarê Dêwulanê de hatibû girtin û piştî heftiyekê bi danîna barimtê, hatibû azadkirin

Herwisa ev çalakvana medenî li 3ê Rêbendana 1403 a Rojî de bi awayekî hovane û bi tundûtîjiyê, ji aliyê hêzên îilaata rêjîmê li bajarê Dêwulanê de hatibû girtin û piştî çendîn demjimêr lêpirsînan bi danîna barimteya 200 milyon Tumenî bi awayê demkî, hatibû azadkirin.

Herwisa “Sohêyla Motaî” li tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê de 2 car hate binçavkirin û piştre ji aliyê dadgeha îqilab a rêjîmê li bajarê Dêwulanê de bi gelemper 60 heyv girtîgeh bi ser de hatibû sepandin ku piştî derbaskirina çendîn heyv a vê sizaya sepandî, hate azadkirin.




## Rêjîma Îranê sizaya girtîgehê bi ser çalakvaneka medenî ya bajarê Dêwulanê de sepand

Dadgeha rêjîmê sizaya girtîgehê bi ser “Sohêyla Motaî”, yek ji binçavkiriyên tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê û çalakvana medenî ya bajarê Dêwulanê de sepand.

Pêka rapora Hengawê, ji aliyê taya 102 dadgeha sizakirin 2 ya rêjîmê li bajarê Dêwulanê, bi tohmeta “propaganda bo girûp û rêkxiravên dijberî rêjîmê” 3 heyv girtîgeh û 3 sal girtîgeha ragirtî bi ser “Sohîyla Motaî” çalakvana warê jinan û yek ji binçavkiriyên tevgera “Jin Jiyan Azadî” û yek ji girtiyên rêûresma “8ê Mars”ê ya sala 1403 a Rojî de sepand.

Ev çalakvana medenî, li 3ê Cozerdana îsal bo vê dadgeha rêjîmê hatibû banghêjkirin lê ji mafê hebûna parêzer li dadgehêkirinê de hatibû bêparkirin.

Sohêyla Motaî li 20ê Reşemeya 1403 a Rojî, ji aliyê hêzên hov ên îtilaat rêjîmê li bajarê Dêwulanê de hatibû girtin û piştî heftiyekê bi danîna barimtê, hatibû azadkirin

Herwisa ev çalakvana medenî li 3ê Rêbendana 1403 a Rojî de bi awayekî hovane û bi tundûtîjiyê, ji aliyê hêzên îilaata rêjîmê li bajarê Dêwulanê de hatibû girtin û piştî çendîn demjimêr lêpirsînan bi danîna barimteya 200 milyon Tumenî bi awayê demkî, hatibû azadkirin.

Herwisa “Sohêyla Motaî” li tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê de 2 car hate binçavkirin û piştre ji aliyê dadgeha îqilab a rêjîmê li bajarê Dêwulanê de bi gelemper 60 heyv girtîgeh bi ser de hatibû sepandin ku piştî derbaskirina çendîn heyv a vê sizaya sepandî, hate azadkirin.




## Rêjîma Îranê sizaya girtîgehê bi ser çalakvaneka medenî de sepand


Dadgeha rêjîmê sizaya girtîgehê bi ser “Sohêyla Motaî”, yek ji binçavkiriyên tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê û çalakvana medenî ya bajarê Dêwulanê de sepand.

Pêka rapora Hengawê, ji aliyê taya 102 a dadgeha sizakirinê a rêjîmê li bajarê Dêwulanê, bi tohmeta “propaganda bo girûp û rêkxiravên dijberî rêjîmê” 3 heyv girtîgeh û 3 sal girtîgeha ragirtî bi ser “Sohîyla Motaî” çalakvana warê jinan û yek ji binçavkiriyên tevgera “Jin Jiyan Azadî” û yek ji girtiyên rêûresma “8ê Mars”ê ya sala 1403 a Rojî de sepand.

Ev çalakvana medenî, li 3ê Cozerdana îsal bo vê dadgeha rêjîmê hatibû gazîkirin lê ji mafê hebûna parêzer hatibû bêparkirin.

Herwisa ev çalakvana medenî li 3ê Rêbendana 1403ê de, ji aliyê hêzên îilaata rêjîmê li bajarê Dêwulanê de hatibû girtin û piştî çendîn demjimêr lêpirsînan bi danîna barimteya 200 milyon Tumenî bi awayê demkî, hatibû azadkirin.

Herwisa “Sohêyla Motaî” li tevgera “Jin Jiyan Azadî”yê de 2 car hate binçavkirin û piştre ji aliyê dadgeha rêjîmê li bajarê Dêwulanê de bi gelemper 60 heyv girtîgeh bi ser de hatibû sepandin ku piştî derbaskirina çendîn heyvan, hate azadkirin.



Agirî

◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (496)

